Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1236 5-Çile-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# ‘Armanc fêrkirina çand û exlaqê Kurdewarî ye’



**Navenda Nûçeyan**

**Mamoste û xwendevanên Akademiya Şehîd Serhed bilêv kirin ku armanca wan fêrkirina çand û exlaqê Kurdewarî ye û bang li tevahî gelê Kurd û bi taybet li ciwanan kirin ku xwedî li çand û hunera Kurdewarî derkevin.**

Akademiyek li ser navê Şehîd Serhed di 1’ê Hezîrana îsal de li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) hatiye vekirin. Di vê akademiyê de dewreyek ya perwerdeya enstrumanan li ser navê Şehîd Devrim hatiye destpêkirin. Mamoste û Xwendevanên vê dewreyê têkildarî perwerdeya xwe ji ANF’ê re axivîn û banga xwedî derketina li çand û hunera Kurdewarî li gelê Kurd kirin. Mamosteya Gîtarê Helena Hilalî diyar kir ku wan li Akademiya Şehîd Serhed a ku 1’ê Hezîranê hatiye vekirin, dewreyek li ser navê Şehîd Devrim daye destpêkirin û wiha peyîvî: “Xwendevanên ku di vê Akademiyê de waneyê dibînin, par li Navenda Stêra Zêrîn bingehê fêrbûna enstrumanan ava kirine. Me di vê Akademiya Şehîd Serhed a bi dewreya Şehîd Devrim vekirî de, êdî bi awayê pispor perwerde daye destpêkirin. Di bingeha vê akademiyê de gelek projeyên me hene, wek şano, govend, stran û hwd. Perwerdeya ku li vêderê tê dayîn, ne wek demkî ye, wê bi awayekî berdewam bên dayîn.”

**‘Mereqa zarokên wargehê ji bo çandê heye’**

Helena di dawiya axaftinên xwe de bi bîr xist ku waneyên ew li vêderê didin ji asta yekem hîn berfirehtire û wiha dibêje: “Hêjmara xwendevanên me bi du koman girtiye dest, ji ber ku xwendevanên koma duyem temenê wan biçûke fêrkirina wan hinekî zehmete. Her yek ji wan koma heftiyê sê rojan tên dersê, li rûxmê ku pir germe jî lê mereqa zarokên wargehê ji bo çandê heye. Li vêderê armanca me ne tenê fêrkirina enstrumanane, fêrkirina çand û exlaqê Kurdewarî ye ku bav, dayîk û kalên me heta roja îro anîn, parastin û domandin. Her wiha em di aliyê îdeolojî de jî xwendevanên xwe rêxistin dikin. Eger em nexwazin qirkirina çandî bi ser me de bê, divê em di aliyê fêrbûna enstrumanan û pêşxistina çandê de berxwedanek mezin bikin. Li pêşiya me 15’ê Tebaxê heye em ê hewl bidin komek a enstrumanan amade bikin ji bo dikê.”

**Armanc sîstema orkestra dayîna avakirine**

Her wiha mamostayê Tembûrê Cemal Hemkî jî têkildarî waneya Sazê ya ku di dewreya Şehîd Devrim de dide, axivî û got: “Ez perwerdeya Sazê didim 38 xwendevanan, hinek xwendevan hene nû fêr dibin û hinek jî astek wan a fêrbûnê heye. Armanca me ew e ku em wan bigihîn astekî wisa ku bikaribin di dema pêş de perwerde bidin. Di biniya akademiyê de perwerdeya Saz, Rîtîm û Gîtar heye. Yek ji armanca me ya sereke ew e ku em li vêderê pergalekê wek orkestra bidin meşandin. Perwerdeya sazê xwedî sê koman e, koma yekem ji demjimêr 17:00 heta 18:00’ê ye. Piştî ku ev demjimêr temam bû, şeş kes asta wan hîn jortire em wana di asta pisportî de fêr dikin. Her wiha koma duyem jî perwerdeya wan rojek heye û rojek nîne, rojên ku perwerdeya wan heyî jî di demjimêr 18:00 heta 19:00’e.” Cemal Hemkî di dawiya axaftinên xwe de ev bang kir: “Weke mamostayek ê Akademiya Şehîd Serhed banga min ew e ku hemû ciwanên Kurd li çand, ziman,huner û adetên xwe yên civakî xwedî derbikevin”

**‘Hîn zêdetir xwe pêş bixin’**

Xwendevana bi navê Dûygû Benek ku waneya gîtarê dibîne jî wiha behsa perwerdeya xwe dike: “Hezkirina min a ji bo gîtarê cara yekem li Navenda Stêra Zêrîn çêbû. Me li Navenda Stêra Zêrîn sê mehan perwerde dît, piştî ku perwerdeya me qediya merasîma derçûnê ji me re hat çêkirin. Her wiha piştî wê, Akademiya Şehîd Serhed hat vekirin li vêderê ez waneya Gîtarê dibînim. Banga min ji bo hemû ciwanên wargehê ew e ku hem li Navenda Stêra Zêrîn û hem jî li Akademiya Şehîd Serhed dest bi perwerdeyê bikin.”

**‘Ji bo min wekî bêhn wedanekê ye’**

Herî dawî xwendevana bi navê Xurbet Arzû ku waneya Sazê dibine, wiha qala heskirina xwe ya ji bo Sazê dike: “Dema ez biçûk bavê min saz lêdixist, ji min re jî sazek biçûk anî û min jî li gel wî lêdixist ji ber wê heskirina min di temenek biçûk de ji bo sazê çêbû. Bavê min ez teşfîqê lêxistina sazê kirim, ji bo wê jî min xwest li ser şopa bavê xwe biçim. Ev du salin ez xwe fêrî sazê dikim, sala destpêkê min di beşa meşq (egzersız) de cih girt, sala din ez derbazî lêxistina muzîkê bûm. Îsal li dibistana Amadeyî ya Şehîd Koçerîn jî me li gel mamostayên xwe yên dibistanê weke koroyekê ji bo 4’ê Nîsanê amadekarî kir û em derketin ser dikê. Min ne xwest dest ji Sazê berdim, ji bo wê ez derbazî Akademiya Şehîd Serhed bûm. Ez gelek kêfxweşim ku hatime akademiyê, lêxistina sazê ji bo min wekî terpiyekê ye ji ber wê ez naxwazim dest ji sazê berdim. Li vêderê hem çand û hunera Kurdî tine nabe û hem jî ez xeyalê malbata xwe pêk tînim. Li wargehê ruxmê ambargoya heyî fêrbûna Saz, Gîtar, Erbane û hwd şansekî herî mezine. Banga min ji bo hemû zarokên Kurd ew e ku ji bo çanda Kurdewarî tune nebe xwe fêrî çand û hunerê bikin.”

# Filmkartona dîroka Kurdistanê

**Navenda Nûçeyan**

Otonomiya Federal a netewî û çandî ya Kurdên Federasyona Rûsyayê bi piştgiriya Ajansa Federal a Karê Netewan a Rûsyayê filmkartonekî ku cih dide dîroka Kurdistanê amade kir. Danasîna film wê di 1’ê Kanûnê de li Mala Kurda ya li paytexta Rusya Moskovayê pêk were. Merasîma danasîna film wê ji aliyê Hevserokê Otonomîya Kurdên Rûsyayê Ferhat Patîyev û derhênera fîlm Gulwayra Kûtsenko ve were bi rêvebirin. Film bi zimanê Rusî ye. Lê tê hedefkirin ku wergera wê ya bi zimanê kurdî jî bê kirin. Otonomiya Federal a netewî û Çandî ya Kurdên Federasyona Rûsyayê di derbarê naverok û armanca film de ev agahî dan:’’Fîlm li ser zarokekî kurd e, ku di dibistaneke Rûsyayê de dixwîne. Navê wî Agir e. Di dibistanê de jê re derfetek tê dayîn ku dîroka gelê xwe bide naskirin û ew dersekê li ser Kurdistanê dide hevalên xwe yên şagirt. Ji bo Kurdên Rûsyayê ev projeyeke nû ye. Di dîroka vê qadê de fîlmên anîmasyon an jî karton ên kurdî nehatine çêkirin. Piştre wê were wergerandin bi zimanê Kurdî û ji bo raya Kurdistan û cîhanê jî were pêşkêşkirin. Amadekarê fîlmê Otonomîya Federal a netewî û çandî ya kurdên Federasyona Rûsyayê ye. Proje bi piştgirîya Ajansa Federal a Karê Netewan a Rûsyayê tê pêkanîn. Armanca fîlm danasîna dîrok, çand û rastîya gelê Kurd ji bo gelên cîhanê ye.’’ Otonomiya Federal a neteweyî û Çandî ya Kurdên Federasyona Rûsyayê bang li derhênerên Kurd jî dike da ku giranî bidin avakirina filmkarton û filmên anîmasyonê yên ku rastîya çand, ziman û dîroka gelê Kurd didin naskirin. Di vê demê de vegotina rastîya Kurdistanê ji bo zarok û ciwanên cîhanê bûyereke jîyanî ye.



Sudoku: Bersiv 21

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 8 | 3 | 5 | 7 | 4 | 1 | 6 | 9 |
| 6 | 4 | 7 | 9 | 8 | 1 | 3 | 2 | 5 |
| 5 | 1 | 9 | 2 | 6 | 3 | 8 | 4 | 7 |
| 8 | 2 | 5 | 7 | 3 | 9 | 4 | 1 | 6 |
| 9 | 6 | 4 | 1 | 2 | 5 | 7 | 3 | 8 |
| 7 | 3 | 1 | 8 | 4 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 3 | 9 | 6 | 4 | 5 | 8 | 2 | 7 | 1 |
| 1 | 5 | 2 | 3 | 9 | 7 | 6 | 8 | 4 |
| 4 | 7 | 8 | 6 | 1 | 2 | 9 | 5 | 3 |

Sudoku:Pirs 22

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 4 | | | | 6 | | 9 |
| | | 8 | 9 | | | | 5 | |
| | | | 8 | | | 3 | | |
| | 3 | | 5 | | 7 | | | |
| 8 | | | 3 | | 9 | | | 5 |
| | | | 6 | | 1 | | 2 | |
| | | 3 | | | 6 | | | |
| | 6 | | | | 5 | 1 | | |
| 9 | | 1 | | | | 4 | 7 | 6 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Mineta te li betenê:**
- Pêwîstiya min bi te nîne; ez ne li ber minetên te me.

**Mineta te li wî kaşî:**
- Bi heman wateyê.

**Ne xema min e, ne dema min e, qirçeqirça benîştê min e:**
- Ji min re ne derd e; kî çi dibêje bila bêje; ez guhê xwe nadim ti kesî.

**Newqa xwe jê re vekir:**
- Bêminet kir; got, tişta ji destê te tê bike.

**Serê ji dê derketî êdî bi şûn ve naçe:**
- Çi dibe bila bibe; ez natirsim; mirov carekê tê dinyayê.

**Serê ji wir derketî êdî naçe wir:**
- Bi heman wateyê.

**Ti kesî destê te negiriye:**
- Tu serbest î; tu çi dikî bike.

**Va ev ez, va ev jî kefenê min:**
- Tu bêminet î; tişta ji destê te tê bike; ez ji her tiştî re amade me.

**Va gez va erz:**
- Tu bêminet î; tişta ji destê te tê bike; ez ji her tiştî re amade me.

**Va gurz va meydan:**
- Tişta ji destê te bê bike; tu bêminet î; ez ji bo şer amade me.

**Wê demê her kes kurê bavê xwe ye:**
- Wê demê bêminetî ye; wê demê kî çi bike gilî û gazind tê de nînin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Rêveberiya Xweser pergala gelan e’



Endamê Meclisa Giştî ya PYD’ê Telet Yûnis da xuyakirin ku desthilatiya demkî ya li Sûriyê ji bona pêwistîyên gel nabe bersiv û wisa got: “Gelê Kurd li Sûriyê hêzeke sereke ye, pêwîste aliyên kurdî jî nakokiyên siyasî bihêlin li aliyekî û yekîtiya xwe ava bikin.”**R-4**

## Saroxan: Pêwîstî bi yekkirina helwesta aliyên kurdî heye




Hevserokê Kongra Îslama Demokartîk Ebdulkerîm Saroxan diyar kir ku ji bo pêkanîna yekrêziya kurdî gelek rêzecivîn ji aliyê Şêx Murşid ve têne lidarxistin, xîtaba van civînan jî ew e ku dem hatiye kurd berjewendiyên xwe yên teng bidin alî û berjewndiyên netewî esas bigirin.**R-5**

## ‘Li gorî derfetan em bi koçberan re dibin alîkar’



Hevseroka Meclisa Bajarê Qamişlo Hêvî Ehmed diyar kir ku ew hemû hewldanên xwe dikin da ku bi koçberan re bibin alîkar, herwiha heya niha 13 navend ji bo koçberan li Qamişlo hatine avakirin û amadekarî ji bo avakirina 7 navendên din jî heye.**R-6**

## ‘Wênesazî asoya xeyalên veşartî ye’



Şêwekar Mî’ad EL-Hamidî diyar kir ku mirov dikare bi rêya wênesaziyê xeyalên xwe yên ku nikare bîne ser ziman, derxe holê û wiha got: “Wênesazî dilê hunerê ye û asoya xeyalên veşartî ye.”**R-7**



**HTŞ’ê wê pir zû bikeve!**
Mihemed Seydî R-4




**Sala çû û sala nû**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1236 5-Çile-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# ÇARESERÎ SÛRIYEKE NENAVENDÎ YE

Piştî avakirina hikumeta demkî ji aliyê HTŞ’ê ve, di heman demê de kiryarên li dijî Elewiyan li beravên Sûriyê, Humis û Hemayê, nêrînên paşverû yên hikumeta demkî li hemberî jin û nêzîkatiyên şaş ji sîstema perwerdeyê re, hişt ku xeterî li ser siberoja gelên Sûriyê zêde bibe û hêviya gelên Sûriyê di vê hikumetê de nemîne. Ji bo avakirina welatekî pirreng û demokratîk ku mafê jinê tê de parastî be, pêwîstî bi avakirina sîstemeke nenavendî heye.**R-2**




## Di 2024’an de Sûriye bû navenda geşedanên siyasî

Sala 2024’an ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya Sûriyê saleke dagirtî geşedanên siyasî û êriş bû. Li aliyekî hêzên dagirker xwestin dagirkeriya xwe firehtir bikin. Li aliyên din jî Rêveberiya Xweser ji bo çareseriya kirîza Sûriyê gelek hewldan kirin.**R-3**



# ‘Bi hişmendiya kevin avakirina Sûriyeke nû ne pêkan e’

Endama Koordînasyona Kongira Star ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Gulistan Gulo diyar kir ku armanca wan avakirina Sûriyeke demokratîk, pirreng, tê de mafê jinê parastî be û wiha got: “Tu hêviyên me di sîstema heyî ya demkî de nîne, ji ber hişmendiya ku li ser hatiye avakirin pêşeroja wê dide diyarkirin.”

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Bi hemdemiya guhartin û veguhartinên ku Sûriyê bi giştî him di aliyê hikumet û him jî di aliyê cografîk de jiyan dike de. Bal li ser rewşa jin di Sûriyê û helwesta jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di vê pêvajoyê de hate kişandin. Têkildarî vê mijarê Endama Koordînasyona Kongira Star ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Gulistan Gulo bersivên pirsên rojnameya me dan.



**1.Rastiya jinê di nava şerên dirêj yê ku di Sûriyê de qewimiye hûn çawa dinirxînin?**

Belê; ger em bixwazibin hinek rewşa jin di Sûriyê û bi giştî binidrxînin divê em hinekî vegerin dîroka ku jin tê de hatiye tunekirin. Ev dîrok jina bi hêz û xwedî îrade bi demê re tune hesibandiye û li ser pişta wê sîstemeke desthilatdar da avakirin û heyanî vê kêliyê jî ew sîstem tê jiyankirin û her kes daye îqna kirin ku jin ev jina heyî ya ku li ser destê zihniyeta zilamparêz hatiye mezin kirine. Ji lewra dema em dîroka ku bi destê desthilatdaran hatiye nivîsandin em dixwînin em tu rastiya jina xwedawend nabînin. Divê em xwe nasbikin û em li xwe bigerin, bi rastî jî di nava Tevgera Azadiyê de Rêber Abdullah Ocalan ev yek ji me û cîhanê re da raber kirin û ji dîrokê heqîqeta veşartî derxist holê.

Bi şoreşa Sûriyê re jî ev yek bêhtir hate xwendin û berfirehtir bû, ew jina niha ya ku em dibînin bi naperojkên xwe ket pey dîrokê û li ser wê esasê gihîş asta azadiyê. Dema ev şoreş hate destpêkirin û me xwe tê de birêxistin kir gelek kesan ji me re gotin we çawa karî xwe ewqas bi lez xwe birêxisstin bikin, lê helbet mîrasekî me ya 50 salê hebû û li ser wê bingehê em di dem û cihê guncav de em rabûn ser piyan; û em wê kedê jî niha di destkeftiyên ku me bi destxistine de em dibînin.

Jina Sûrî bi taybet di nava ev şerên dirêj û navxweyî de, rastî gelek êş û zehmetiya hat. Di van salên derbasbûyî de bedelên herî giran jinên Sûriyê bi hemp pêkhateyên xwe dan û heyanî vê kêkiyê jî êşa wê yekê dikşîne. Jin di Sûriyê de rastî gelek kiryar û binpêkirinên mirovî hat. Komên çeteyên ku bi armancên qirkirin û talankirinê xwe birêxistin kirbûn, bi gavên xwe yên destpêkê jin kirin armancên xwe û bê guman gelek kiryar di heqê wê de hatin kirin.

Di aliyekî din jî hin tevgerên jin di Sûriyê de xwe li ser bingeheke demokrasiyê û rêxistinbûna jin hatin avakirin, weke Meclîsa Jinên Sûriyê hate avakirin û di gelek aliyan de xebatên berfireh dan meşandin. Ew meclîs belkî zehmetê di xwebihanda hemû jinan weke jinên Siwêda, Heleb, Himos, Hemayê û Şamê lê xwe digihandin wan û di astekê de têkiliya wan bi me re jî hebû. Bê guman gelek astengî jî didîtin di nava sîstemeke weke sîstema Sûriyê de, lê bi rastî jî karîn xwe bi rêxistin bikin û xebat kirin.

**2.Li hemberî zordariya li ser jinê ku bi dehan salan dewam dike, sîstema nû ya Sûriyê heya çi astê dikare bibe bersiv?**

Berî her tiştî hebûna jinê misogeriya avakirina sîstemeke demokrat e. Di 8 ê Kanûnê de Sîstema Sûriyê hate hilweşandin û Sûriyê kete merheleyeke nû. Em niha gav bi gav dişopînin ka wê sîstem û Sûryeyek çawa wê bê avakirin. Ehmed El Şerea ango Hikumeta demkî ya nû wê bikaribe Sûriyê birêve bibe? Wê bikaribe hemû netewên di herêmê de hembêz bike?; mixabin heyanî niha jî di tu peyamên wan de derneketiye, yek gotina demokrasiyê ji devê wan derneketiye. Tenê kesayet hatine guhartin lê sîstem û hişmendî hê jî weke xwe ma ye. Bê guman Sûriyê pir renge û divê li ser esasê xwedîderketina li vê pirrengiyê sîstema nû bê avakirin. Ger ne wisa be evqas sal ji kirîz û berdêl wê vala biçe.

Li gorî gavên destpêkê me dît ku Wezîrê Adaletê destnîşan kir ku; çênabe jin cihê xwe di karê adeletê de bigire, her wiha Ayşe Dibis ya ku niha weke berpirsê kar û barê Ofîsa jin dane erkdarkirin, dibêje ku “jin tenê divê mal, malbata xwe îdare bike û li gorî eqîdeya xwe tevbigere û zarokên xwe xwedî bike. û em rê nadin ku tu fikirên din di Sûriyê de pêşbikevin”. Ê bê guman ev yek dide diyar kirin ku ev sîstem nikare tu guhartinan di aliyê mafê jinê de bide avakirin, her wiha bi terzê xwe yê heyê wê nikaribe ji pirsgirêkên ku jin jiyan kirine re bibe bersîv û di serdema nû ya ku em weke serdema jinê pênase dikin, wê di Sûriyê de tu rengê jinê nîn be. Ji lewre tu hêviyên me di sêstema heyê ya demkî de nîn in, ji ber hişmendiya ku li ser hatiye avakirin pêşeroja wê dide diyarkirin.

**3.Di serdema Nû ya Sûriyê de pêwîste jin çawa tev bigere?**

Bi van geşedan û guhartinên siyasî yên ku di Sûriyê de tên dîtin re, em weke jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê emê dest bi şorşeke nû di Sûriyê de bikin. Ev mîrasa ku di şoreşa Rojavayê Kurdistanê û di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatiye avakirin emê di va serdema nû de derbasî Sûriyeya nû bikin. Diviya bû ev yek zûtir bihate kirin, lê ji ber perçebûna axa Sûriyê belkî me nikarî bû xwe bigihanda jinên Şam, lazqiyê, Siwêda, Homis û Hemayê.

Nûmûneya ku jinên Kurd, Ereb, Ermen, Sûryan, Çerkez û Tirkmen di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de avakirin, wê ji erka me be ku em vê yekê derbasî Sûriyê bi giştî bikin. Me di daxuyaniya xwe ya ku di dîroka 28 ê Kanûnê de ragihandiye de jî me anî ziman ku emê bi hev re Sûriyeke demokratîk, pirrengî, ne navendî û tê de azadiya jin misoger be avabikin. Yanî jin di destur û sîstema Sûriyê de bi îradeya xwe cih bigire û xwedî biryar be.

Bê guman gelek tevger û jinên ku ji bo demokrasî û misogeriya mafê jinê têkoşîn dikin hene em bi wan re di nava têkiliyan de ne. helbet biryara me jî ew e ku emê dev ji têkoşîna xwe bernedin heyanî ku em van pîvanên xwe di hemû Sûriyê de pêk bînin.

**4.Di Sûriya pêşerojê de pêwîste sîstemeke çawa bê avakirin ji bo misoger kirina mafê jinê?**

Bê guman ger rewş bi vê awayî berdewam bike wê tu çareserî ji rewşa Sûriyê û bi taybet ji bo misogeriya mafê jinê nîn be. Em dibînin ku heyanî niha kiryar û êrîşên dagirkeriya Tirkiyê tên berdewamkirin, di aliyê din de destwerdanên Tirkiyê ji bo Sûriyê hîn jî hene, bi taybet Hakan Fîdan hat Sûriyê û hevdîtinên xwe bi Colanî re kirin. Divê Sûriyê pirsgirêk û sîstema xwe bi xwe çareser bike, dewleta Tirkiyê weke dewleteke dagirker e û divê ji xaka Sûriyê bi temamî derbikeve da ku sîstemeke guncav bê avakirin.

Bi rastî jî armanca me avakirina Sûriyeke demokratîk, pirreng tê de mafê jinê parastî be, helbet emê ji bo vê yekê jî têkoşîna xwe berdewam bikin. Lê di sîstema heyî ya demkî de ji bo misogeriya mafê jinê tu hêviyên me tê de nîn in.

# Di sala 2024’an de 358 jin hatin qetilkirin

**Navenda Nûçeyan**

**Li Tirkiyeyê di sala 2024’an de ji bo pêşîgirtina li tundiya li ser jinê tu gav nehatin avêtin. Li Tirkiyeyê di sala 2024’an de 358 jin û 43 zarok hatin qetilkirin, 221 jin û 31 zarok jî bi guman jiyana xwe ji dest dane.**

Polîtîkayên desthilatdariya AKP-MHP’ê yên li dijî jin û zarokan di sala 2024’an de di zêdebûna tundiyê de rol lîst. Di dema ku mafên destkeftiyên jinan yek bi yek dibin hedef, zimanê tundiyê ku di medyaya dijîtal û li kuçe û kolanan de serdest e û polîtîkaya bêcezakirinê ya darazê veguheriye komkujiya li ser jin û zarokan. Li aliyê din jinan dev ji têkoşîna jiyanê bernedan.

Li gorî daneyên ku JINNEWS’ê berhev kirin heta 26’ê Kanûnê di sala 2024’an de 358 jin û 43 zarok hatin qetilkirin, mirina 221 jin û 31 zarokan jî bi guman e.

* Di meha Çile de 27 jin û 4 zarok hatin qetilkirin, mirina 17 jin û 3 zarok jî bi guman e.
* Di meha Sibatê de 39 jin hatin qetilkirin û mirina 15 jinan jî bi guman e.
* Di meha Adarê de 24 jin û 2 zaroka hatin qetilkirin û mirina 24 jinan û 2 zarokan jî bi guman e.
* Di meha Nîsanê de 30 jin û 3 zarok hatin qetilkirin û mirina zaroke û 15 jinan jî bi guman e.
* Di meha Gulanê de 34 jin û 8 zarok hatin qetilkirin û mirina 18 jinan û 2 zarokan jî bi guman e.
* Di meha Hezîranê de 38 jin û 10 zarok hatin qetilkirin û mirina 2 zarok û 7 jinan jî bi guman e.
* Di meha Tîrmehê de 21 jin û 4 zarok hatin qetilkirin û mirina 22 jinan û 2 zarokan jî bi guman e.
* Di meha Tebaxê de 31 jin û 5 zarok hatin qetilkirin û mirina 15 jin û 3 zarokan jî bi guman e.
* Di meha Îlonê de 30 jin û zarokek hat qetilkirin û mirina 15 jinan û 4 zarokan jî bi guman e.
* Di meha Cotmehê de 43 jin û 6 zarok hatin qetilkirin û mirina 22 jin û 4 zarokan jî bi guman e.
* Di meha Mijdarê de 32 jin û zarokek hat qetilkirin û mirina 25 jinan û 5 zarokan jî bi guman e.
* Di meha Kanûnê de jî 10 jin û 6 zarok hatin qetilkirin û mirina zarokek û 6 jinan jî bi guman e.






# ‘Wênesazî asoya xeyalên veşartî ye’

Şêwekar Mî’ad EL-Hamidî diyar kir ku mirov dikare bi rêya wênesaziyê xeyalên xwe yên ku nikare bîne ser ziman, derxe holê û wiha got: “Wênesazî dilê hunerê ye û asoya xeyalên veşartî ye.”

**Dilovan kêfo/Amûdê**

Şêwekar Mî’ad El-Hamidî di sala 1996’an de li bajarê Amûdê ji dayik bûye, xwendina xwe ya seretayî, navîn û amedahî li bajarê Amûdê qedandiye, ji ber ku ew di nav malbateke hunerî de mezinbûyî, wî ji biçûkanî ve ji hunerê hez kirîye û fêrî şêwekariyê bûye.

Derbarê hunera şêwekariyê de, şêwekar Mî’ad El-Hamidî ji Rojanameya me re axivî .



Me’ad El-Hamidî di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Ji ber ku bavê min jî wênesaz bû, min ji zaroktiya xwe ve ji xêzkirinê hez kir. Dema ku bavê min tabloyek xêz dikir, min lê temaşe dikir, ji ber wê heskirina min ji wênesaziyê re roj bi roj zêde bû û ez bi vê hunerê re hatim girêdan. Ji ber hezkirina min tya zêde ji wênesaziyê re ez pir zû di vê hunerê de pêşketim. Kesê ku ji wênesaziyê hez bike helbet dikare xwe fêr bike û pêş bikeve. Di dema niha ez wekî pispor hunera şêwekariyê dikim û xwendekaran li çand û hunera Amûdê fêrî şêwekariyê dikim. Gelek xwendekar li ser destên min fêrî şêwekariyê bûne û niha şêwekarên ji xwe bawer in.”

**‘Bi hezkirin û israrê zehmetî derbas dibin’**

Mî’ad balkişand ser zehmetiyên ku derketine pêşiya wî û wiha got: “Zehmetiya yekem ku derket pêşiya min, nebûna cihekî taybet ku ez karibim lê karê şêwekariyê bikim. Ya duyem jî li kêleka şêwekariyê karên min yên din jî hebûn ku pêwîst bû ez bidim meşandin. Lê bi hezkirineke mezin min tevahî zehmetiyên ku derketin pêşiya min derbas kir û xewin û xeyalên xwe pêk anî. Bi heskirinê astengî derbas dibin.”

**‘Ez bi xêzkirinê hestên xwe derdixim’**

Me’ad El-Hamidî di derbarê kar û xebatên xwe yên şêwekariyê de wiha got: “Di xêzkirina tabloyan de tu rengên min yên taybet tune ye, ez ji tevahiya rengan hez dikim. Lê ez li gorî hestên ku ez tê re derbas dibim, ez hemû rengan bikar tînim. Wênesazî tu karê bibêje ku çi tiştên di dilê mirov de be dikare bi riya wênesaziyê derxîne holê .”

**‘Pêwîste her ciwanek xwedî li jêhatiyên xwe derkeve’**

Mî’ad El-Hamidî di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Ez dixwazim herdem xwe pêş bixim û di asta xwe de nemînim. Herwiha banga min ji bo her ciwanekî ku xwedî li jêhatî û xeyalên xwe derkevin, bi hezkirin û perwerdeyê her tişt pêkan e.”



# ‘Hevêrka Coltrane’ û felsefeya muzîkê

**Navenda Nûçeyan**

**Muzîk ku xwedî bingeheke kûr e, tenê bi notayan nayê şîrovekirin. Her wiha ew bi geometrî û bîrkariyê jî tê şîrovekirin. Hinek muzîkjen ji bo têkiliya muzîkê ya bi bîrkariyê re nîşan bidin li bingeha muzîkê kolane û bi vî awayî encamên balkêş derketine holê. Hevêrka Coltrane jî yek ji van encamên balkêş e ku bala mirov dibe ser felsefeya muzîkê.**

**Roger Federîco**

Qada muzîkê jî weke hunerên din xwedî gelek ezmûn û ceribandinan e. Muzîk tenê ne ew deng in ku em dibihîsin û pê hestiyar dibin. Her wiha tenê ne notasyonên xav in jî. Ji vî tiştî wêdatir muzîk xwedî raman û felsefeyekê ye. Gava mirov çav bi xebatên hin muzîkjenan û lêhûrbûnên wan ên li ser muzîkê dikeve mirov vê yekê baştir fam dike. Ji mêj ve têkiliya di navbera bîrkarî (matematîk) û muzîkê de tê zanîn. Gelek zanyar û muzîkjen di vî warî de fikr û nihêrînên xwe bi awayekî şênber ango bi nivîskî anîne ziman û behsa vî tiştî kirine. Weke nimûne Pîsagor li ser vê têkliyê dibêje; “Di zimîniya têlan de geometrî û di navbera giloveran de jî muzîkek heye.”

John Coltrane ku ew yek ji hostayên Cazê ye û weke bestekar û şefê orkestrayê jî tê zanîn, bi xebata xwe ya “5 hevêrk (çember)” nîşan da ku ew jî di rêya Pîsagorî de diçe û



di vî warî de eynî weke wî difikire. Ev xebata John Coltrane ku dişibe diyagramekê ew ê di warê muzîkê de bi navên “Hevêrka Coltrane” û “Hevêrka tonê (tonalite) ya Coltrane” jî bihata zanîn.

**Bûye îlhama ‘geometriya muzîkê’**

John Coltrane di sala 1967’an de hin xêzên geometrîk çêkir û van xêzên xwe nîşanî hevalê xwe yê seqsefoncî yê bi navê Yusef Lateef da ku ew di heman demê de profesorek bû. Xêzên Coltrane dişibiyan saetekê, saeteke ku notayên muzîkê bi navberên wekhev digihandin hev û bi desenên giloverî hatibû çêkirin. A rast ev weke diyagramekê hatibû sêwirandin û paşê ev diyagram bi navê Coltrane hate bibîranîn. Ev dîyagrama ku bi navê “Hevêrka Coltrane” tê zanîn têkiliya di navbera muzîk û matmatîkê de radixe ber çavan. Coltrane vê yekê bi awayekî dîtbarî nîşan daye, yanî wî bi vî awayî razberiya muzîkê wekî tiştekî şênber nîşan daye. Ev xebata wî di warê “geometriya muzîkê” de bûye îlhama gelek xebatên dîtir.

**Têkiliya muzîk û bîrkariyê**

John Coltrane bi dîyagrama xwe ya geometrîk ango “Hevêrka Coltrane” 12 tonên nîvco yên “gamên kromatîk” teswîr dike. Yanî wî di vê dîyagramê de van yekan şirove kiriye. Mirov dikare bibêje ku wî bi vê dîyagramê nexşerêyekê jî derxistiye. Nexşerêya notasyon û tonên ne diyar ku dikarin ji gelek hêlan ve bi awayekî cuda werin nirxandin. Rêgezên ku wî diyar kirine an jî şirove kirine di tewriya muzîkê de ne ew tişt in ku nayên zanîn lê John Coltrane bê xêz û gewmetriyê şiroveyeke xweser pêş xistiye di vî warî de û nîşan daye ku di bingeha muzîkê de gewmetrî, felsefe û bîrkarî heye.

**Kompozisyonên nehênî û pergala muzîkê ya îlahî**

Li gor lêkoler û zanyaran gava John Coltrane bi vê dîyagramê daketiye ji xebatên Albert Einstein û muzîka Hîndûyan îlhamê girtiye û piştî lêhûrbûneke kûr “Hevêrka Coltrane” sêwirandiye. Ev diyagram her çend li ser teoriya muzîkê hatibe sêwirandin jî hêleke kompozîsyonan a nehênî (mîstîk) jî heye. Xêzên li ser giloverên bi hevdu ve girêdayî desenên stêrkan ava kirine û bi vî awayî huner û teoriya muzîkê bûne di hêmayên ku hevdu temam dikin û hêzê didin hevdu. Arun Ghosh ku ew klarnetvanekî bi ser xwe re bû, Hevêrka Coltrane bi vî awayî şirove dikir; “Pergaleke muzîkê ya ku bi tiştên îlahî re têkilî datîne.” û digot ev dîygarama Coltrane nêzî taybetmendiyên dînê Îslamê ye.

**Têkiliya ‘kûantûm’ û teoriya muzîkê**

Li hêlekê şîroveyên bi vî rengî hebûn li ser “Hevêrka Coltrane” lê li hêla din jî lêhûrbûna Coltrane ya di warê fizik û zanistê de nîşan dide ev diyagram. Stephon Alexander ku fizîknasek bû û di heman demê de li seqsefonê dixist pirtûkeke bi navê “The Jazz of Physics” dinivisîne û di vê pirtûkê de ji bo John Coltrane dibêje; “Rêgezên ku Coltrane li ser sekiniye û xebitiye ‘teoriya kûantûm’ a Einsetin îşaret dikin. Wî bi vê teoriyê xwe motîve kiriye.” Her wiha tê zanîn ku Coltrane ji hevalê xwe yê muzîkjen Davîd Amram re behsa “teoriya kûantûm” a Einstein kiriye û gotiye ku ew dixwaze di muzîkê de tiştekî bi vî rengî pêk bîne. Wekî din wî bi çend kesên din re jî ev mesele nîqaş kirine û behsa têkiliya teoriya muzîkê û kûantûmê kiriye.

**Manewiyat û muzîk**

John Coltrane bi vê dîyagram an jî xebata xwe têkiliya di navbera mûzîk, manewîyat, geometrî û bîrkariyê de pirr xweşik rave kiriye û nîşan daye ku muzîk xwedî rehên kûr û dûr in. Her wiha ew nîşan dide ku muzîk xwedî raman û felsefe ye jî. John Coltrane ji bo muzîka xwe wiha digot; “Muzîka min, îfadeya manewiyatê ye; bawerî, zanîn û hebûna min e.”

**John Coltrane kî ye?**

Di sala 1926’an de li Bakûrê Corolîna hate dinyayê. Pirr xweşik li seqsefonê dixist û di vî warî de tekane bû. Di warê cazê de yek ji şirovekarên herî jêhatî û serketî tê zanîn. Her wiha wî di vî warî de gelek tiştên nû jî ceribandiye û li teoriya muzîkê kolaye. Demek dirêj li seqsefonê dixe û paşê weke tenor jî dixebite. Bi muzîkjen Miles Davis re weke tenor dixebite. Ew li Emerîka û li dinyayê weke “fîgûrê caza avangard” tê qebûlkirin.

Di sala 1967’an de gava 40 salî ye jiyana xwe ji dest dide û ji vê dinyayê koç dike. Piştî ku di dimire şûnde, di sala 1992’an de Xelata Grammy werdigire.

# Nexweşiya penceşêrê li herêmê

Rêvebera Nexweşxaneya Onkolojî ya bajarê Qamişlo Hediya Ebdullah diyar kir ku ew li gorî derfetên xwe bi nexweşên penceşêrê re dibin alîkar û tedawiya pêwîst pêşkêş dikin. Hedeiya da zanîn ku ji bo ew rêjeya nexweşan nas bikin, wan bi rêya bernameya KOPO dest bi pirojeya serjimariyê kiriye.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di laşê mirov de hemû lebat ji şaneyan pêk tên. Şane mena herî biçûk ya laşê zindiyane, herwiha bi çavan nayê dîtin, tenê bi riya hûrbînên pêşketî tên dîtin.
Şaneyên bedenê yên bijûn (ji xeynî şaneyên masûlke û tûreya ) xwedî hunera parbûnê ye. Vê hunera xwe bi armanca nûkirina şaneyên mirî û selihandina raçîngên birîndar bi kar tînin. Lê ev hunerên wan jî bi sînor in. Bêdawî par nabin. Di jiyana her şaneyê de parbûnek diyar heye. Şaneyek bijûn dizane ku dê li ku û çi qasî par bibe.
Li hemberî van şaneyên penceşêrê bîra xwe wenda dike, dest bi parbûna bêkontrol dike û zêde dibe. Şaneyên penceşêrê kom dibin û girêdana (tumor, kîtle) pêk tînin. Girêban dikarin raçîngên normal biçewisînin, dikarin têkevin hundirê wan an jî dikarin wan texrîb bikin. Ger şaneyên penceşêrê ji girêbanên pêk anîne veqetin dikarin bi rêya gera xwînê an lenfê biçin deverên din ên bedenê. Li deverên ku diçinê koloniyên grêban pêk tînin û pirbûna xwe didomînin. Şaneyên penceşêrê bi vî şiklî li deverên laş belav dibin ku ji vê re tê gotin metastaz.
Penceşêrên ku di şiklên cuda de, di lezbûnên cuda de mezin dibin, şiklên belavbûnê yên cuda nîşan didin û bersivê didin tedawiyên cuda. Ji ber vê di tedawiyên nexweşiyên penceşêran de li gor cûreyê penceşêrê yên ku hene tedawiyên cuda tê bikaranî.
Nexweşiya penceşerê ji berî şoreşa rojava pir zêde bû, li gorî rêjeya navenda Şamê, piraniya wan nexweşan ji herêma cizîrê bû, piştî şoreşê barê nexweşan zêde bû ji bo çûyîna tedawiyê li Şamê, nexweşxaneya penceşêrê ji hêla Heyva Sor ya Kurd hate vekirin da ku bare wan sivik bikin. Derbarê vê mijarê rêvebra Nexweşxaneya Penceşêrê Hediya Ebdullah ji rojnameya me re axivî.

**Sedemên zêdebûna nexweşiya penceşêrê:**

Rêvebera nexweşxaneyê Hediya Abdullah ji me re sedemên zêdebûna vê nexweûiyê anî zima û wiha got: "Sedemên nexweşiya penceşêrê wiha ne: Petrol li herêma me heye, ev dibe sedema qirêjiya jîngeh, zêdebûna hejamra jenertor û wesayîtan, sotemeniyên neft û gazê nema weke berê paqije dihêle ku rêjeya qirêjiyê zêdetir bibe, vexwarina çixaran û xwerinên hazir."

**Cureyên penceşêrê li herêma me**

Hediye Ebdullah anî ziman ku gelek cûreyên penceşêrê hene û wiha domand: "Li herêma me zêdetir nexweşiya penceşêra pêsîr û ya malzarokê li cem jinan heye. Herwiha ya kolon, roviyê zirav û ya birostatê jî heye."
Hediye Abdullah balkişand ser jimara nexweşên penceşêrê li herêmê û wiha domand: "Em nikarin bêjin ku hejmara nexweşan zêde bûye ya na, herî kêm sê sal divê lêkolîn bê kirin da ku jimarê diyar bikin, Heyva Sor a Kurd niha li ser bernameya KOPO projeyeke serjimariyê daye destpêkirin, ew ê di sê salan de hejmar herî zêde li kîjan herêmê zêde ye, kîjan cûre ya herî zêde belav bû ye û sedemên wê, diyar bikin."

**Ji bo tedawiyê nexweş neçar diman biçin Şamê**

Hediya Ebdullah wiha domand:" Ji ber tunebûna tu xeste an navendeke ji bo tedawiya nexweşiya penceşerê li herêma me, nexweş neçar diman ku berê xwe bidin Şamê, vê yekê bare wan girantir kir. Ji bilî rêya seferê û mayîna li wir, derman pir buha ye, mîna ku li nexweşxaneya Beyrûnî ya Şamê derman bûye ji sedî 90 tê frotin. Gelek zehmetî bi xwe re dianî ji milê pîskolojîk û madî ve."
"Ev heye nêzî salekê Heyva Sor a Kurd xesta erkolojîk vekir da ku barê van nexweşan sivik bike, çûna dervî herêmê hem di eynî demê de dîtina bijşkan lêhurbûn, îko. Dermanê kîmwayî nêzî serê sedî 70`ê cûreyên wê hatin peyda kirin, bê dirav. "

**Peydakirina dermanan**

Hineke cûreyên penceşêrê hene dermanê wan pir zehmete ku bên peyda kirin, li gorî derfetan em ê hewil bidin wan peyda bikin, ji ber ku ji nû ve xeste hatiye vekirin û tu destek dayîn nehatiye pêşkêşkirin. Her kes dizane ku deman û tedawiya nexweşiya penceşêrê pir giran û buha ye, hin dermanên kîmawî hene bi 100$ ye, li gorî xeta tedawiyê ya ku bijîşk ji nexweş re tê dayîn, li gorî vê yekê dibe ku tedawî 1 caran dermanê kîmawî bê dayîn an kêmtir.
Hêjayî gotinê ku li nexweşxaneyê tedawî b giştî ya nexweşiya penceşêrê bê dirave.

**Kengî kîmawî pêwste:**



Li gorî rêvebera nexweşxaneya penceşêrê Hediya Abdullah, dema ku girêka penceşêrê tê emelyatkirin pêwistî bi kîmawî heye. Du cureyên tedawiyê heye ya kîmawî û radyasyonê, ji xwe cîhazê radyasyonê tune ye û derbaskirina wê zehmete ji bo herêmê, tenê bi kîmawî tedawî tê kirin. Di dema pêş de ku derfet hebe wê ev daxwaz bê peyda kirin. Hediye Abdullah wiha got:"Tu temenekî diyarkirî ji bo vê nexweşiyê tune ye, bi her kesî re çêdibe, çiqas mirov xwezayî be û dûrî tiştên nexwezayî bikeve ewqsî wê tenduristiya mirovan ji hemû milî ve baş dibe û parêza xwe ji penceşêrê bike.

**Nîşaneyên penceşêrê:**

Nîşaneyên zanîna nexweşiyê ji nexweşekî ji bo yê din cuda ye, hin jê nayê zanîn heta bighêje asta dawî ku nexweşî di laşê mirov de belav dibe. Hejmara nexweşan di nexweşxaneyê de nêzî 330 nexweş hatin pêşwazî kirin ji destpêka vekirina nexweşxaneyê. Li naxweşxaneya nexweşeke bi navê Îsa Musa 35 salî ye diyar kir ku ev saleke li nexweşxaneyê xwe tedawî dike, lê berê li nexweşxaneya beyrûnî dima, piştî vekirina nexweşxaneyê ji hêla Heyva Sor a Kurd li Qamişlo, min êdî li vir xwe tedawî kir. Barê me pir giran bû, ji bilî çûn û hatinê û mayîna li otêlan û dermanan, li nexweşxaneya penceşêrê barê me sivik bû, derman tê peyda kirin, tenduristiya min her ku diçe baş dibe, her du hefteya carekê têm ji bo tedawiyê.



## Sala çû û sala nû

Hafiz Ahmet Turhalli

Me salekî din li pey xwe hişt. Zaliman zulma xwe berdewam kir, mezlûman jî berxwedan û tekoşîna xwe bê navber meşandin. Bê guman her dem û sal jî, ji jiyana me kêm dike. Em karibin çiqas tiştên baş û xweş bikin, ji bo me ewqas pêşveçune.
Kesê Bawermend divê hesabê xwe li gor kiryarên xwe bizanibe. Divê mirov karû barên baş pêşxîne û başiyan zede bike.
Sala 2024'an ji bo me Kurdan salakî dijwar bû. Ev pêncî sale em tekoşînekî bê hempa dimeşînin, dimrin, dikevin, radibin, tên girtin û têdikoşin.
Sala çûyî ji stûnên dagirkerên Kurdistanê yek din jî helweşîya.
Sûriyeya ku jêre digotin Sûriya Ereban an rjîma Baasê, rûxiya û serokê rejîmê reva rev, xwe gîhiştand Rusyayê.
Rejîma Baas bi sed hezaran mirov koçber kirin, kuştin zîndanî kirin, heman aqubet bi serê wêde jî hat. Wek Ppêşiyên me Kurdan gotine "Tu çi bajo, tû yê wê biçînî"
Kesên ku van planên zilmê û nebaşiyan çêdikin, divê ji salên bûrî û dîrokê dersan wergirin. Plan û projeyên ji bo desthelata nû hatine çêkirinê jî, ger ser zilm û neheqiyan bimeşîn dê ewjî biruxin.
Kesên neha erka Sûriyê girtine, ji Tirkmenistanê bigre heta Urdunê, kesayetên ne ji ser xaka sûriyêne! Lê kesên niştecîhên Sûriyê dikujin, qetil dikin û zîndanî dikin.
Gelo ev rewşa neha hatiye dîyarkirin, ew ê karibe were daqultandin?
Tramp bu serokê dewletên yekbûyî Emerikayê. Rûsya ji Rojhelata Navîn hate qewitandin. Hilweşîna sûriyê hevsengiya siyasetê li Rojhelata Navîn tevlî hev kir. Diyare kesê sîstemên xwe neguherînin û xwe nujen nekin, ew ê werin têk birin.
Guhertin divê ne li gor hêlekî, an terefekî be, divê guhertin li gor xaka Sûriyê, kêm netewên wê, cudahiya Ol û mezhebên wê werin amade kirin.
Ger desthelattdarê neha jî, xwe binavê sunnîtiyê liser gelan û olan ferz bikin, her aqibeta Beşar dê li sere wanbe.
Sala çuyi me çi karibû pêk bi anîta, me ne anî? Kurdan destkeftî bi dest xistin, divê ev destkeftî werin mezin kirin, pêştexistin û misogerkirin. Gelê me kare jibo rojhelata navîn, bibe mînak: Weke di dîroka mirovahiyêde gellekî caran buye pêşengê aşitî aramî û azadiyê. Împaratoriya Medan, Ebû Muslîmê Xoresan û Selheddînê Eyyûbî weke tecrûbeyên dîrokî di deste medene. Rojhelata navîn dikele, dewleta Tirk fîtnekariya xwe bê navber didomîne û dixwaze desthelata xwe berfirehtir bike. Gelo dê ew derfet jibo wî hebe an na? Sala çu Rûsya, Îranê, Lubnanê, Hîzbullahê, Hamasê û Sûriye bun hêla têkçuyiyan. Lê kifşeye jibo salî tazejî van aliyan ji buyeran, ders negirtine û guhirtinên jibo gelên ser xakên xwe ne amadene. Tirkiyejî li tembura par dixe, ev jî dide xuya kirin ku, li beramber guherînan, bi taybet di meseleya Kurdî de ser parametreyên berê dimeşe. Ev meşa Tirkiyê aqîbeta Suriyê wê bixwer bîne.
Pirsgirêkên meyên navxweyijî zelal nebune. Hêjî aliyên di bin bandora politikaya dewleta Tirkande mane û jibo berjewendiyên wan sîyasetê dikin hene. Divê zutirîn dem Kurd liser Berjewendiyên xweyê netewî yekrêziya mala xwe pêk bînin.
Sala 2025'an divê di Rojavayê Kurdîstanêde yekitiya meya netewî were bi cîh kirin. Serkeftina Rojava serkeftina Rojhelata Navîne.

# 'Li gorî derfetan em bi koçberan re dibin alîkar'

**Diyala Nîdal/ Qamişlo**

**Hevseroka Meclisa Bajarê Qamişlo Hêvî Ehmed diyar kir ku ew hemû hewldanên xwe dikin da ku bi koçberan re bibin alîkar, herwiha heya niha 13 navend ji bo koçberan li Qamişlo hatine avakirin û amadekarî ji bo avakirina 7 navendên din jî heye.**

Dema ku çeteyên girêdayî dewleta Tirk êrişî Şehbayê û Til Rifetê kirin, piraniya gelên wan herêman koçber bûn û berê xwe dane herêmên Rêveberiya Xweser ên bi ewle. Rêveberiya Xweser jî li gorî derfetên xwe alîkariyê pêşkûş dike û xwedî li gelê xwe derdikev.
Di derbarê rewşa koçberên Şehbayê û Til Rifetê ku li bajarê Qamişlo bicih bûne, hevseroka Mecilsa Bajarê Qamişlo Hêvî Ehmed ji rojnameya me re axivî.

**'Em li gorî derfetan pêşewaziya gelê xwe dikin'**

Hêvî Ehmed di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Dema ku gelê me yê koçber berê xwe dan bajarê me, me weke Rêveberiya Xweser pêşewaziya wan kir û me daxuyanî li ser vê bingehê da. Ji ber ku amadekariyên me ne ji sedî sed bû, me seferberî ragehand. Ji bo vê rewşa awarte me bangewazî kir, di heman demê de li ser vê bangewaziyê hemû sazî, dezgeh, mirovên welatparêz û gelê Rojava bi giştî li koçberan xwedî derketin. Pêşewaziya koçberan hat kirin û hem ji aliyê gel, bazirgan, rêxistan û bi taybet Rêvberiya Xweser pêdiviyên sereke ji bo koçberan hatin peydakirin û li gorî derfetan gel bi koçberan re bûn alîkar."

**'Barê herî giran barê Rêveberiya Xweser e'**

Hêvî Ehmed da zanîn ku derfetên wan kêmin, ji ber ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giştî di nav şer de ye û wisa got: "Derfetên me ne zêde ne ku em pêşewaziya koçberan bikin, ji ber êrişên dewleta Tirk li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet binesaziya herêmê bi giştî kirye hedef. Ji ber vê yekê derfetên me kêmin ne zêde ne,



ji ber ku em di rewşeke şer de jiyan dikin û me her tiştê di welatê xwe de bi gelê xwe yên koçbere parvekiriye tevlî van derfetên kême. Herwiha destpêkê rewşeke awarte bû û bi hezaran koçber berê xwe dane herêma me, ji ber vê yekê me gelek malbat bi cih kirin, ji bo parastinê û hin koçber hebûn ku rewşa wan ya teduristî ne baş bû û bi taybet rewşa zarokan. Ji ber ku demsala zivistanê avhewa sare, ji ber vê yekê zarok bi gelek nexweşiyan dikevin. Lê em li gorî derfetên di destên xwe de xwedî li koçberan derdikevin û barê herî giran barê Reveberiya Xweser e."

**Pirojeyên dema bê**

Rêvebera Mecilsa Bajarê Qamişlo Hêvî Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em hedî hedî ji bo koçberan navenda ava dikin û ev navend ji dibistanan pêk tên. Di dema niha 13'ê de navend ji bo koçberan hatine avakirin û amedekariyên me ji bo vekirina 7ê' navend din re jî hene. Ji ber ku koçberan bi giştî lê bi cih bikin, ji ber ku cihê niha koçber lê bicih bûne nebaşin hem avahiyên nehazir in, lê dema niha em navedên xwe hazir dikin ji bo koçberan di wan de bi cih bikin. Herwiha alîkariyên ji bo koçberan ji aliyê rêxistinên mirovî hebûn ji aliyê pêdiviyên jiyanê yên sereke tenê ji bo zarokan hat kirin. Lê tu alîkarî ji aliyê çeksaziyê, mazot û avê tu alîkarî ne hatiye kirin , Rêveberiya Xweser barê wê girt li ser milê xwe û daxuyanî da û got ku ew li hêviya tu kesî namînin. Ji ber ku gelek kesan got emê bibin alîkar lê tu alîkariyeke baş nehatkirin û Rêveberiya Xweser weke çeksazkirina navendan û xwedî derketin li koçberan bi rewşeke awarte de ji hemû aliyan ve bicihkirina koçberan radibe."



# Di 2024'an de Sûriye bû navenda geşedanên siyasî

Sala 2024'an ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya Sûriyê saleke dagirtî geşedanên siyasî û êriş bû. Li aliyekî hêzên dagirker xwestin dagirkeriya xwe firehtir bikin. Li aliyên din jî Rêveberiya Xweser ji bo çareseriya kirîza Sûriyê gelek hewldan kirin.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Weke tê zanîn geşedan û rojeva sereke li tevahiya Kurdistanê, Pêngava Azadiya Rêber Apo ye, ev pêngava di 9'ê Cotmeha 2023'an de dest pê kir, ji destpêka sala 2024'an ve, meş û çalakiyên li herêmê dihatin lidarxistin, ji wan jî meşên gerseyî yên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêbûn. Hem jî hemleya komkirina Îmzeyan di 9'ê Sibatê de dest pê kir û 4'ê Nîsanê bi komkirina 3 milyon û 700 îmzeyan bi dawî bû. Herwiha piştî vê hemleyê di 4'ê Nîsanê de pêngav kete asta xwe ya duyem de. Di heman demê de ji bo rojbûna Rêber Apo bi hezaran dar li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin çandin. Li gel wê jî bi dehan daxuyanî ji hêla parêzer, partiyên siyasî û saziyên curbecur ve hatin dayîn. Di 10'ê Gulanê de Insiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê dest bi serdana tevahiya partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Sûriyê kir û di 28'ê heman mehê jî serdan bi dawî bûn. Piştî van serdanan jî, Insiyatîfê di 29'ê Pûşberê de dest bi serdana eşîr, oldar û pêkhateyên cihêreng yên kantona Cizîrê kir û hîna jî ev serdan tên domandin. Herwiha di salvegera destpêkirina komployê de jî meşên girseyî hatin lidarxistin. Piştî berxwedaniyeke mezin de a li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê û cîhanê tevî, di 23'ê Cotmehê de Umer Ocelan hevdîtinek bi Rêber pêk anî. Rêber Apo di hevdîtinê de nameyek ji bo gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz da.

**Êrişên li ser herêmê**

Êrişên dagirkeriya Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê her û her didomin, dagirkeriya Tirk di şeva 23'ê Cotmehê de careke din bi awayekî hovane dest bi êrişên xwe yên qirkirinê yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Dagirkeriyê di êrişên xwe de wekî her car binesaziya herêmê û mal û milkên welatiyan kir armanc. Di encama êrişên ku heta niha dewam dikin, bi dehan welatî şehîd û birîndar bûne, stasyonên elketirîk, petrol, gaz, û gelek cihên xizmetguzarî hatin hedefgirtin û ji kar derketin. Di wê dema kurt de êriş bi giranî li ser gel dihat kirin, lê encamên wê pir giran bûn. Li gorî bîlançoya êrişan a ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn belav kirinbû, hat eşkerekirin ku dewleta Tirk a dagirker bi balafirên keşfê û yên şer, topbaranê 685 caran êriş herêmê kiriye û di encamê de 17 şênî şehîd bûye û 48 jî birîndar bûn. Bi giştî dewleta Tirk 685 caran êriş herêmê kiriye. Di encama wan êrişan de, 14 sivîl şehîd bûne 3 endamên hêzên leşkerî. Bi giştî 17 kes di bombebaran û topbarana dewleta Tirk de gihaştin asta şeheadetê. Di heman demê de 48 kes jî birîndar bûn.39 sivîl birîndar bûn 9 endamên hêzên leşkerî. Jê û bi şûn ve jî êriş ranewestiyane û hîna jî didomin. Her tim dewleta Tirk bi buhaneyan û di encama pirsgirêkên hundirîn de êrişî gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Wekî em dizanin ji destpêka damezirandina DAIŞê'ê heta roja îro dewleta Tirk jê re û ji komên çete wekî Nusra, Cêş Elwetenî û hwd… bûye dayikek û terorê xwedî dike. Her tim jî van komên çete li dijî gelên Sûriyê bi kar tîne, herî zêde li herêmên dagirkirî ev yek çêdibe. Bila li bala me be dema ku bi piştevaniya Tirkiye û pêşengtiya Îran komên çete di 6'ê Tebaxê de êrişî Dêrazorê kirin. Van komên çete bi pêşengtiya Îranê tevlîheviyek di herêmê de dan avakirin û gelên wê kirin armanc. Bandora vê êrişê li ser tevahiya herêmê çêbû, herî zêde li ser nûvejînkirina DAIŞ'ê hebû.

**Hewldanên dewleta Tirk ji bo lihevkirina bi Şamê re**

Piştî ku dewleta Tirk a dagirker di hundir û derveyî sînorê xwe de lawaz bû, di nîvê sala 2024'an de dest bi hewldanên lihevkirina bi hikumeta Şamê re, kir. Ji wê demê ve heta roja îro Tirkiye dixwaze bi riya Rûsyayê vê lihevkirinê pêk bîne. Di destpêka 2024'an bi taybet 24'ê Çile civîna Asîtana ya 21'ê weke hertim ji aliyê hêzên navdewletî yên weke Rûsiya, dewleta Tirk a dagirker, Îran, şandeyên hikumeta Şamê û Opozisyona Sûrî ya bi ser dagirkeriya Tirk ve li Kazaxistanê hat destpêkirin. Wekî her tim armanca van aliyan di serî de dewleta Tirk a dagirker ew bû ku Rêvberiya Xweser têk bibin û gelên herêmê qir bikin. Lê wekî hercar armancên wan vala derketin. Lewma jî da ku Erdogan xwesteka xwe bi cih bîne, xwest ku serdana Koşka Spî bike û hevdîtinê bi Baydin re bike, di nav re jî Erdogan erêkirinê mijara êrişa li dijî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dest bixe, lê xwesteka wî bi cih nehat. Dewleta Tirk hewldanên xwe ranewestandin, hetanî lidarxistina Civîna Asîtana ya 22'an. Di wê civînê de jî Erdogan dixwest ku bi Essed re bicive û gavên bingehîn ji bo lihevkirinê bavêje. Rûsya û hikumeta Şamê dibînin ku hetanî dagirkeriya Tirk li ser xaka Sûriyê heye, wê lihevkirin di navbera Şam û Tirkiyê de çênebe.



**Bertekên Israîl derbarê Îran û bêçarebûna Şamê**

Pişî rûdana şerê di navber Israîl û Hemasê de, bi buhaneya hebûna Îranê û komên girêdayî wê, Israîl gefa dide Sûriyê û êriş dike. Ev yek ji sala bûrî ve di rojevê de, jê wê demê hetanî roja îro Israîl deverên weke Şam, Tertûs, Humis û gelek bajar û deverên dike armanc. Êrişên Israîl piştî kuştina Hesen Nesrellah dijwartir bûn, li Lubnanê jî êrişên giran pêk hatin û di encamê de bi hezaran penaberên sûrî derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn, bi wan re bêtirî 100 kesên Lubnanî jî hatin herêma Rêveberiya Xweser. Herî dawî ji derbeyên giran li ser Sûriyê, êrişa li ser bajarê Tedmurê ya girêdayî Şamê bû. Di encama vê êrişa ku ji hêla Israyîl ve di 20'ê Mijdarê de, pêk hat, 92 çekdarên girêdayî Îranê hatin kuştin û 4 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan. Herwiha di nav geşedanên ku li ser Sûriyê pêk tên, sivîl û leşker tên kuştin, di encama meha Mijdarê de li gorî Rewangeha Sûrî ya Mafê Mirovan pîlançoya êrişên Israîlê li ser Sûriyê wiha bû: 18 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan, 8 jî birîndar bûn, 130 leşkerên girêdayî Îranê û hikumeta Şamê hatin kuştin, hem jî 68 ji wan birîndar bûn. Hikumeta Şamê ji van êrişan bêçare ye û hin caran daxuyaniyên şermok dide, ev jî nîşana bêhêzbûnê ye. Sala 2024'an tev jî derbas dibe û hîna jî mûşekek Şamê neghaştiye Israîlê. Piştî ku hikumeta Şamê û Rûsyayê ji pilanên Israîl derbarê Sûriye û Lubnanê de agahdar bûn. Herwiha helwestên xwe ji bo hebûna îranî li Sûriyê guherandin û pilanin hatin danîn ku zextê li Îranê bikin da ku Îran lawaz bikin li herêmê. Piştî ewqas êrişan, nexasim derbeya giran a Tedmurê, Îran neçar bû ku serkirdeyên xwe vekişîne ber bi sînorê Îraqê ve. Li hemberî vê yekê jî Hêzên Hevpeymanî li zeviyên petrolê yên Umerî ya Dêrazorê, amadebaşiyên xwe kirin. Di heman demê de Hêzên Sûriyaya Demokratîk û Asayîşê jî li Dêrazorê hemleyên ewlekariyê pirtir kirin.

**Hewlên çareseriya kirîza Sûriyê**

Şandeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û MSD'ê di çarçoveya hevdîtinên xwe yên li derveyî welat de, di 16'ê Pûşberê de hevdîtinek li avahiya parlamantoya Almanyayê ya li Berînê pêk anî. Di hevdîtinê de rewşa Sûriyê, astengiyên siyasî, aborî û ewlehî yên li pêşberî Rêveberiya Xweser hatin vegotin. Herwiha rîska DAIŞ'ê û têkiliya wê bi êrişên domdar ên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmê hatin nirxandin. Komxebata Yekîtiya Niştîmanî ya Eşîr û pêkhateyên Sûriyê bi beşdarbûna nêzî hezar kesî, di 25'ê Gulanê de dest pê kir. Komxebat ji aliyê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û MSD`ê ve di bin diruşmeya (Diyalog, Ewlekarî, Avakirin, ji bo Sûriyeke yekgirtî û nenavendî), hate lidarxistin. Li aliyekî din di 21 û 22'ê Îlonê de Kongreya PYD'ê li dar ket û di kongereyê de jî hat tekezkirin ku pêkanîna diyaloka sûrî-sûrî li ser esasê demokratîk û avakirina pêşerojeke aşityane û wekheviyê ye. Hem jî tevahî gelên Sûriyê bibin xwedî mafên wekhev û parastina berjewendiyên hemû gelan û di serî de doza gelê kurd. Ji bo mijara çeteyên DAIŞ'ê jî û bi armanca pêkanîna ewlehiyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di 27'ê Çile de û di 5'ê Cotmehê de du hemleyên ewlehiyê li Kampa Holê ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn û QSD'ê ve pêk hatin. Li ser asta diplomasî jî hewldanên Rêbeberiya Xweser, partiyên siyasî, rêxistin û tevgerên ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê hatin meşandin, di heman çarçoveyê de gavên mezin hatin avêtin. Mîna lidarketina Kongreya Riya Demokratîk a Sûrî, Kongreya Riya Demkratîk a Sûrî di 25 û 26'ê Cotmehê de bi armanca çareserkirina kirîza Sûriyê li paytexta Belçîkayê Brukselê hat lidarxistin. Herwiha 128 kes ji hundir û derveyî Sûriyeyê tevlî vê kongreyê bûn, ji wan kesên ku amade bûn, gelek siyasetmedar ji hemû pêkhateyên Sûriyê, MSD'ê, Rêveberiya Xweser, partiyên kurdî û kesên biyanî bûn. Di dema heyî û pêşerojê de li ser asta cîhanî Rêveberiya Xweser bi hemû rêbazan hewl dide ku pirsgirêka Sûriyê çareser bike û Sûriyeke demokrat-nenavendî ava bike.

# ‘Rêveberiya Xweser pergala gelan e’

Endamê Meclisa Giştî ya PYD’ê Telet Yûnis da xuyakirin ku desthilatiya demkî ya li Sûriyê ji bona pêwistîyên gel nabe bersiv û wisa got: “Gelê Kurd li Sûriyê hêzeke sereke ye, pêwîste aliyên kurdî jî nakokiyên siyasî bihêlin li aliyekî û yekîtiya xwe ava bikin.”

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Piştî hilweşandina Rejima Bees li Sûriyê hikûmetek demkî hat avakirin. Di wê hikûmetê de, di serî de HTŞ’ê gelek çekdarên komên çete yên giredayî dewleta Tirk ya dagirker bicîh kirine. Di Sûriyê de pêkhateyên cûda jiyan dikin. Ji xwe kiryarên ku niha li herêmên Elewî tê de jiyan dikin tên kirin, berçav e. Gelê Kurd weke hêzeke sereke yê Sûriyê tê dîtin. Gelo hikûmeta xwedî vê hişmendiyê wê bikare ji hewcedariyên gel re bibe bersiv? An jî di bi hebûna kurdan û pêkhateyên din Rêveberiyeke Xweser ava bibe?

Derbarê geşêdanên ku li Sûriyê pêşdikevin û giringiya yekitiya gelên Sûriyê, Endamê Meclisa Giştî ya PYD’ê Telet Yûnis ji rojnameya me re axivî.



**‘Rejîma Baas’ê nedikarî hêviyê gelê Sûriyê pêk bîne’**

Telet Yûnis bi lêvkir ku hişmendiya komên çete yên girêdayi dewleta Tirk hişmendiya terorane ye û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Piştî hilweşîna deshilatiya rejîma Baas’ê ya dehan salan bi tûnd û zextê dihat meşandin, hat rûxandin. Rejîma Baas’ê ti caran heviyên gelê Sûriyê re nebû bersiv. Piştî serhildanên tevahî Sûriyê yên gel, 2009’an û şûnda pêngava aliyê gel ve bi bingeha hilweşandina Rejîma Baas’ê hat avêtin. Rejîmê nedikarî hevîya gelê Sûriyê ti caran pêk bîne. Ji bona guhertinek demografî ti caran ne amade bû. Rejîma Baas’ê xwastekên gel hertim bi tûnd û komkûjiyê bersivandin. Kiryarên hovane li ser gelê Sûriyê dihat meşandin. Ji bona nerazîbûna xwe bidin nîşandan gelek caran serhildanên gel çêbûn. Di saya berxwedana gelên herêmê de, rejîma li Sûriyê desthilat bû, hilweşiya. Di 8’ê Berfanbara 2024’an de serdemek nû ji bona tevahî Sûriyê, taybet bo gelê Kurd ava bû. Lê dagirkeriya Tirk bi qelsiya hikûmeta hatiyê hilweşandin ya Baas’ê û aloziya di Sûriyê de sûd wegirt û çeteyên girêdayî wê axa Sûriyê dagir kirin. Paytexta Sûriyê Şam jî di nav de, gelek bajarên pêkhateyên cûda tê de jîyan dikirin, dagir kirin. Sûriyê bû navenda alozî û gengeşeyên Rojhilata Navîn. Gelek hêzên navnetewî di Sûriyê de hebûn, lê yek jî ji wan pêşiya dagirkeriyê negirtin. Gelek komên çekdar yê bi navê HTŞ û çeteyên girêdayi dewleta Tirk yên dagirker komkujiyên mezin pêk anîn. Hêzên girêdayî rejîma Baas’ê di derdora rojekê de bajarên wek Heleb, Idlib, Himis û herî dawiyê Şam jî radestî komên çete kirin. Ev plansaziyek dewleta Tirk bû û hevkariya rejîma Baas’ê û Rûsyan ev pêk anîn. Herî dawiyê jî êrîşên dagirkeriyê li ser cihê koçberên gelê Efrînê Şehba û Til Rifet hat kirin.”

**‘Di çareserkirina aloziya Sûriyê de modela Rêveberîya Xweser e’**

Telet balkişand li ser pêşketinên nû yê Sûriyê, herwiha rola Kurdan di rêveberiya Sûriyê nû bê avakirin de û axaftina domand: “Piştî hilweşandina rejîma Baas’ê gelek pirsên bê bersiv mejiyê mirovan de derbas dibin. Weke ku komên çete kiryarên wan yên bajarên dagirkirî baş tê zanîn. Ev komkûjî û qirkirinên ku bajarên dagirkirî weke Efrîn, Serêkanîyê û Girê Spî pêktînin, di heman demê de niha bi tevahî Sûriyê de pêktînin. Ev komên çete ji kiryarên xwe bi rejîma Baas’ê xerabtirin. HTŞ’ê û komên çete yên girêdayî dewleta Tirk yên dagirker dizî û zordariyê zêdetir tiştekê ji bo gelê Sûriyê nakin. Di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, modela rêvebêrina tevahî Sûriyê Rêveberiya Xweser û demokratîk e. Ji ber ku Rêveberiya Xweser pergala gelan e. Gel bi xwe bi vîna xwe ya azad xwe rêve dibe e. Bi hêzên xwe yên leşkerî û saziyên xwe yên civakî bûn dermanên gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Bi mafên rewa parastina gelê xwe û xaka xwe dikin û xwe diparêzin. Ev pergala rêveberiyê bi nêrîn û daxwaziyên gel ve hate pejirandin. Ev pergale ne weke yên komên çete tûndrew e, ne jî weke yê rejîma Baas’ê girêdayî deshilatdariya malbat û berjewndiyên takekesî ne. Di nûnerên hemû pekhateyan bi hevre dijîn û xwe rêve dibin. Bi kurtasî pirsgreka Sûriyê pirsgrêka revêbirinê ye û çareserkirina wê jî bi modela Rêveberîya Xweser e. Rêveberîya Xweser û projeya Netewa Demokratîk pêşîlêgirtina aloziyên Sûriyê û Rojhilata Navîn e. Ev çawa Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye ceribandin pêwîste di Sûriyê tevahî ji bi wê pergalê bê rêvebirin. Di 11 salên derbasbûyî de, di wê modela rêvebirinê de gelek pêşketinên asta serkeftinê de hatin jiyandin. Hîn hêzên paramîlîter hewildan kirin ku ji bona Sûriyê ji derveyî Sûriyê rêve bibin. Lê rêya tekane ji bona demokrasiya Sûriyê, rêvebirina bi netewa demokratîk û ramanên Rêber Apo pêkan e.”

**‘Dijminên gelê Kurd hertim hewildan ku kurd nebin yêk’**

Yûnis herî dawiyê balkişand li ser girîngiya gelê Kurd, rista kurdan li tevahî Sûriyê de û wiha axaftina xwe qedand: “Dijminê gelê Kurd hertim hewildan kirin ku ji bona gelê Kurd yêkrêziya xwe ava nekin. Her çar beşên Kurdistanê jî, dijmin sinor xwistiye navbera Kurdan de. Ji ber ku helwest û nêrîn nebûn yêk dijminên Kurdan bi vê valatiyê sûd wergirtin. Mafên gelê Kurd û çarenûsa wê piştî avakirinek Sûriyeke nû bû rojevekî nû. Gelek caran ji bona yêkrêzîyê hewildan hatn kirin, lê ev hewildan bê bersiv man. Hevcadarî taybet bi wê pêvajoyêde yekbûyin û yêkrêzêya gelê Kurd heye. Ji bona bikarin bi Sûriyeke nûve hatiye dizaynkirin mafê gelê Kurd biparêzin û nûnertiya gelê Kurd bi hêzên ku niha Sûriyê de serwer bikarin biparêzin. Fermandarê QSD’ê birêz Mazlûm Ebdî jî li ser wê mijarê ji bona hêzên Kurdî bangewaziyek kir. Em jî wek PYD’ê jî me ev nerîn pir erenî nirxand û em tevlî wê bangawziyê bûn. Lê kesayetên xwedî hişmendiya yêknebûyinê ENKS’ê tevlî wê komxebatê nebû. Lê em dîsa bang dikin ku yêkrêzîya Kurdan tê wateya avakarina Sûriyeke nû, li ser wê bingehê dibe em yêkreêziya xwe avabikin. Kurd hêza herî bingehîn yên Sûriyê û Rojhilata Navîn in.”



## HTŞ’ê wê pir zû bikeve!

**Mihemed Seydî**

Em derbasî sala nû bûn û dawiya sala kevin ango 2024 ji bo gelê Sûriyê pir cuda bû. Bi dawiya salê re, dawî li desthilata rêjîma Baas a zêdetirî 40 salî tirs û xof ava kiribû, hat û serokê wê Beşar El-Esed ji welat reviya. Bi vê rewşê re wêneyekî cuda derket û koalisyona Astana ya sêalî Îran- Rûsiya û dewleta Tirk hilweşiya. Vê koalisyona ku ji bo berjiwendiyên xwe miletê Sûriyê tev perîşan kirin û bûn sebeba dirêjkirina aloziyê.

Bi ketina Rêjîmê re xelkê Sûriyê kêfxweş bû, lê dema ketin ferqê ka kî li şûna vê rêjîmê bi cih dibe, tirs kete dilê wan. Serokê desthilata niha li Şamê ku bi navê Ehmed El-Şerie tê ziman, Berpirsê Heyit Tehrîr El-Şame ku di lîsteya terorê ya cîhanê de ye. Her çiqasî propaganda tê kirin ku ew guheriye û bi mêjiyê rêveberiyeke ku hemû xelkê Sûriyê hembêz bike wê tevbigere, lê tevgerên li ser erdê çêbûn berovajî ne. Piştî HTŞ bû desthilat, komên cîhadîst bi nava Laziqiyê û Tertûs ketin, ku piranî xelkê wê Elewî ne û dest bi komkujiyan kirin. Li aliyê din, di bin navê ku alîgirên rejîma berê ne, li gorî agahiyan, di nava heft rojên derbasbûyî de 700 mirov hatiye girtin. Yanî, careke din hemû girtîgehên Rêjîma Baas ger rewş wiha dewam bike, ew ê bi însanan werin dagirtin.

Li aliyekî ev desthilata nû tirs û xofê belav dike, li aliyê din qale jinûve avakirina dewletê û sazkirina Artêşê dike û şert datîne ku divê hemû hêz çekên xwe radest bikin. Ev daxuyaniya çekradestkirinê jî serokê HTŞ’ê Ehmed El-Şerie got û pê re jî dewleta Tirk daxuyanî da. Lê dewleta Tirk dema ku qale çekdanînê dike, armanca wê Kurdin û dixwaze çawa di serdema DAIŞ’ê de li Şengalê komkujî pêk hatin, careke din komên xwe yên çete bişîne ser wan û qira kurdan bîne.

Lê QSD’ê bersiva van daxuyaniyan da û got ew amadeye bibin beşek ji artêşa Sûriyê ya pêşerojê lê bi şertê ku taybetmendiya hêza wê parastî bimîne.

Hemwextî van daxuyaniyan jî dewleta Tirk bi çeteyên xwe êrîşî Bendava Tişrîn û pira Qereqozakê dikirin û şerekî giran heta nivîsandina vê gotarê jî dewam dikir.

Ehmed El-Şerie yê li hember dagirkeriya dewleta Tirk û êrîşên li ser bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe bêdeng kiriye, ji wî be bi rastî ew bûye serokê Sûriyê û divê hemû hêz di bin fermana wî de bin.

Li ser vê fikrê, Serokê HTŞ’ê çekdarên xwe şandin Parêzgeha Siwêdayê û ji wî be piştî ketina rêjîmê ew ê hemû alî bibêjin hûn desthilat û em xwe radstî we dikin an jî bi tirsê ew ê gelê Sûriyê teslîm bigrin. Lê bersiva ku ji civaka Durzî ya li Siwêdayê derket ew bû ku wê rê neyê dayîn tu kom derbasî nava herêma wan bibin û ger êrişek an jî ferzkirine li ser wan bibe, ew ê doza Federaliyê ji bo xwe bikin.

Lê ya balkêş di van daxuyaniyên serokê HTŞ’ê de Ehmed El-Şerie de ew e ku qale komkirina çekan dike lê qale çeteyên dewleta Tirk û dagirkeriya wê li nava bakurê Sûriyê nake, berova jî wê bi kujerê seroka Partiya Sûriyê ya Pêşerojê Hevrîn Xelef wêneyan digre û li gel çeteyên dewleta Tirk kom dibe.

Lê divê yên li ser kursiya li Şamê nû rûniştine, bizanibin tu tiştek wekî xwe namîne û yên silogana ‘an Esed an em ê welat bişewitînin’ jî piştî 13 salan ji şer ji nav wenda bûn, reviyan û nema dengê wan derdikeve. Divê yên li Şamê mêjiyê xwe bixin serê xwe û rêzê ji taybetmendiya xelkê Sûriyê bigrin. Li Beravê Elawî, li Siwêdayê Durzî û li bakur û Rojhilatê Sûriyê jî Rêveberiya xweser hene û divê rêz ji wan re were girtin an jî DAIŞ û Esed çawa bi dawî bûn, ew ên din jî weke wan bi dawî bibin. Ji ber Sûriya welatê pir rengiyê ye û êdî ferzkirina terzekî jiyanê yê biyanî ji xelkê wê, ne pêkane. Ger HTŞ bixwaze li ser riya DAIŞ û Baas bimeşe, ew ê pir zû bikeve.

# ‘Em ê li dijî êrişan bibin bersiv’

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Ciwanên Qamişlo diyar kirin ku serferberiya ku hatiye ragihandin erkeke dikeve ser milê tevahî ciwanan, herwiha destnîşan kirin ku divê li gorî şerê gelê şoreşgerî xwe amade bikin.**

Piştî rûxandina rêjîma Baas, dewleta tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê, derfet dîtin ku xaka sûriyê dagirbikin, ji dema rûxandina rêjîmê û êrişên çeteyan li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet li Minbic û Kobanê berdewam e, Hêzên Sûriya Demokratîk li dijî van êrişan disekinin û berxwedaniyeke mezin didin meşandin. Herwiha da ku li beramberî van êrişan bisekinin Rêveberiya Xweser seferberiya giştî ragihand, da ku gelê herêmê bi taybet ciwan xwedî li xaka xwe derkevin û li dijî her êrîşekê amade bin.

Derbarê vê mijarê de ciwanên Qamişlo ji rojnameya me re amadekariyên xwe anîne ser ziman.

Endama Meclisa Yekîtiya Jinên Ciwan Nadiya Yûsif, derbarê êrişên ku li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tên ji hêla çeteyên girêdayî dewleta tirk a dagirker wiha anî ser ziman:”Ne roja yekemîn û ya dawî ye em rastî êrişên bi vî awayî tên, bi taybet li bajarê Kobanê û derdora pira Qereqozaqê û Minbicê. Berxwedaniyeke bêhempa ji hêla hêzên me ve tê kirin. Li Minbicê sînaryoya Efrînê tê dûbare kirin, ji kuştin, dizî û talankirina mal û milkan. Dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê bi vîn û îradeya gelê herêmê wê tu carî nikaribe herêmên me dagir bike. Dewleta tirk dixwaze di hikumeta nû de hikmdariya xwe bide meşandin. Em qebûl nakin ku piştî ji desthilatdariyekê xelasbûn rastî desthilatdariyeke hovtrîn bên.”

**‘Em ê bibin bersiv li dijî êrişan’**

Nadiya Yûsif wiha axaftina xwe bi dawî kir:” Em ê li beramberî êrişan weke ciwan bê bertek nemînin, şoreşa ku ev zêdetirî 12 salan rû daye, bi pêşengtiya jin û ciwanan gelek deskeftî bidestxistin, em ê her van destkeftiyan biparêzin, xwedî li şehîdên xwe derkevin yên ku ji bo oxira vî welatî canê xwe feda kirin û tevlî seferberiya giştî bibin ya ku Rêveberiya Xweser ragihandiye. Em ê bibin besiv û li dijî êrişan bisekinin. Weke ciwan em berpirsyariya vê yekê ji erkê xwe dibînin, ji ber ku erkê me yê bingehîn jî ev e. Seferberiya ku hatiye ragihandin pêwîste di serî de em ciwan cihê xwe di nav de bigrin. Em bang li hemû ciwanan dikin ku xwedî li xak û bajarê xwe derkevin û welatê xwe ji dagirkeriyê biparêzin.”



Nadiya Yûsif



Nasir Nesro

Ji aliyê xwe ve hevserokê Meclisa Ciwanên Sûriya Demokratîk Nasir Nasir destnîşan kir ku herêmên me di bin xeteriya dagirkeriya tirkiyê de ye. Êrişên dewleta tirk li ser herêmên me berdewam e û dixwazin ewlehî û aramiya herêmê xirab bikin û tevlîheviyê di navbera pêkhateyan de derxîne. Hêzên Sûriya Demokratîk di çeperên şer de hem li Kobanê hem jî li Minbicê û heremên din, bi berxwedaniya xwe destanên dîrokî dinivîsînin.

**‘Erkê ciwanan ew e ku herêmên xwe biparêzin’**

Nasir Nesro di dawiya axaftina xwe de wiha got:” Weke ciwanên Sûriyeyê, maf û erkê me ye ku em herêmên xwe biparêzin. Divê ciwan her dem li qadên berxwedanê cihê xwe bigrin, li welat û gelê xwe xwedî derkevin, li ser bingeha şerê gelê şoreşgerî xwe amade bikin û di hemû milan de bajarê xwe biparêzin, çi di milê şerê rasterast an şerê taybet û di milê avakirina eniyên hundirîn û avakirina coş, baweriyên gel û xurtkirina hêzên leşkerî.”



# Saroxan: Pêwîstî bi yekkirina helwesta aliyên kurdî heye

Hevserokê Kongra Îslama Demokartîk Ebdulkerîm Saroxan diyar kir ku ji bo pêkanîna yekrêziya kurdî gelek rêzecivîn ji aliyê Şêx Murşid ve têne lidarxistin, xîtaba van civînan jî ew e ku dem hatiye kurd berjewendiyên xwe yên teng bidin alî û berjewndiyên netewî esas bigirin.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê rêzecivînên ku ji bo yekrêziya kurdî ji aliyê Şêx Murşid El-Xeznewî ve têne lidarxistin, hevserokê Kongra Îslama Demokartîk Ebdulkerîm Saroxan bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Gelo piştî hilweşandina rejîma Baas a Eseed wê sîstema Sûriyê ya nû bibe muxatebê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê?**

Piştî hilweşandina rejîma Baas û têkçûyîna desthilatdariya Şamê, pêvajoyekî nû li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye destpêkirin. Li gorî vê pêvajoya nû em ê çi bikin, bi kê re têkoşîn bikin û azadiya xwe misoger bikin. Herwiha wê kî bibe muxatibê me, kî şûna wê desthilatdariyê dagire û çawa bibin alîkar di avakirina sîstemekî nû ji bo Sûriya giştî, ev hemû pirs têne kirin,? Ji bo vê yekê têkoşîna me berdewam e, da ku em pirsgirêkên xwe yên sereke çareser bikin, ji van pirsgirêkên sereke, pirsgirêka yekê pirsgirêka gelê kurd weke mijara dîrokî, çandî, siyasîye, hebûna wê weke netewekê ye, ev hemû cihê lêpirsînê ye ku em helwesta xwe bidin diyarkirin û pirsgirêka kurd di hundirê çareseriya pirsgirêka Sûrî de çareser bikin. Pirsgirêka din ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê



ye, pêkhatiyên ku niha lê jiyan dikin, mîna kurd, ereb, suryan û hwd… wê çawa cihên xwe di nava sîstem an jî hikumeta Şamê ya nû de bigire, ji bo van pirsgirêkan hewldanên me hene.

**-Hatina Şêx Murşid El-Xeznewî ji bo Rojava li ser çi bingehê ye û xîtaba wî di derbarê yekrêziya kurdî de bi çi rengî ye?**

Şêx Murşid El-Xeznewî ji Ewropa hatiye, kesekî oldare cih wî di nava civaka de, cihê rêz û hirmetê ye. Hatina wî li ser bingeha xizmeta gelê wî ye, da ku nêzîkatiyekê di nava hemû aliyên siyasî de pêk were û yek helwesta kurdî derkeve. Şêx Murişd di nava axaftinê xwe de anîbû ziman ku heta niha îş derbas dibû, ewqas pirsgirêk giran giran nebûn, lê niha dema wê hatiye, êdî di qonaxa ku em tê de derbas dibin, pêwîste em kurd nêzî hev bibin, ji bo wê ez hatime erkê dikeve ser milê xwe bikim û bi aliyên kurdî re yekrêziyê ava bikin. Herwiha helwesta me li beramberî hikumeta Şamê ya demkî yek helwest be, Şêx Murşid li ser vê daxwazê vegeriya Rojava, kar û xebatekî di vî alî de dide meşandin. Di vê serdema ku niha em tê de ne, dergeh li pêşiya her kesî vekiriye, her kes jî para xwe bixe nava vê têkoşînê de, ji bo yekrêziya kurd were çêkirin û beramberî hikumeta Şamê ya nû xîtaba xwe bikin yek.

**-Şêx Murşid El-Xeznewî gelek hevdîtin bi aliyên siyasî û gel re pêk anîn, di van hevdîtinan de xîtaba Şêx Murşid û helwesta gel bi çi rengî ye?**

Di çarçoveya pêkanîna yekrêziya kurdî de gelek çalakî pêk hatin, ji van çalakiyan jî hevdîtina bi gel re, ji ber ên sereke û girîng gelê me yê kurde. Rêzecivîn ji milet re tê lidarxistin, bi hemû aliyên xwe, bêyî ku aliyeke cûda êdî hazir bibe. Di van civînan de xîtaba ku tê kirin kurd hemû nêzî hev bibin. Êdî hûn gel binerin ku rêxistinên we yên siyasî di vê pêvajoya niha de, nêzî hev nebû, li beramberî wê xwedî helwestin. Dem hatiye ku em ejindeyên xwe yên siyasî û partî bindin milekî û bi ejndeya xwe ya netewî kurdewarî wê werin ba hev û têkoşîn bikin, xîtab tev bi vî rengî têne kirin, li bajar bajar civînê têne lidarxistin, hin bajar lê hatin lidarxistin û hîn jî dewamin. Gel bi hestekî pir cûda pêşwaziya van nirxandinan dike, êdî li çavên gel dinêre tije rondik dibe, ji kêf û eşqa ku xîtabekî bi vî rengî tê kirin û kurd dixwazin wek rêxistin nêzî hev bibin.

Gel li beramberî guhertinên ku têne kirin, êş û azarên ku hatine dîtin, parastin û berevaniya xwe kiriye, rêxistin û saziyên xwe yên civakî ava kirine, hem jî yekîtiya xwe ava kirine. Civak di her alî de parastina xwe dike û balê dikşîne ku êrişên pir cûda tê ser Kobanê û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, gefên pir dijwar ji aliyê Tirkiyê ve li ser herêma têne xwarin. Edî em çawa xwe biparêzin? Gel li benda vê gotinê bû, helwesta herî giran û terzê parastina xwe li beramberî vê bikin. Yekrêziya me ew e ku em karibin xwe li beramberî van êrişên li ser gelê me têne kirin, bigirn, bêyî ku em têk biçin.

**-Şêx Murşid El-Xeznewî di axaftinên xwe de li ser çi xalan tekez kir?**

Mijarên girîng ku têne ziman, QSD’e hêzeke leşkerî ye, parastina vî gelî kiriye û rûmeta vî gelî parastiye. Herwiha ji aliyê QSD’ê ve hemû aliyên siyasî û civakî hatiye parastin, her kes di aramiyê de jiyan dike. QSD’e erkê parastinê girtiye ser milê xwe bêyî cûdahiyekê, Şêx Murşid tekez dike bêtir li ser van xalan. Ya din jî destkeftiyên ku hatine avakirin, heta ji we were parastina wan bikin, nehêlin ku ev destkeftî ji dest we herin, xîtabekî bi vî rengî tê kirin. Kêm û kurtasî di nava kar de hene, ji aliyê Rêveberiya Xweser û partiyan de hin kêmanî derdikevin, lê niha ne roja wê ye, ew jî dibê cihê çareseriyê, lê ya girîngtir heye ku em li ser wê bixebitin. Derfet jî niha di destê me de ye, divê em van derfetan ji dest nebin.

**-Gelo Şêx Murşid El-Xeznewî di axaftinên xwe de bangewazî ji partiyên li Başûrê Kurdistanê re kir û bangewazî çi bû?**

Tişta herî balkêş Şêx Murşid bangewazî ji bo Partî Demokratî Kurdistan, Yekîtî Niştîmanî Kurdistan kir ku li gelê Rojava bibin xwedî, gelê Rojava beramberî zehmetiyekî pir cedî de ye, dijminê me biryara tunekirina wî girtiye, lewra pêwîste partiyên Kurdistanî bi hêz û erkê xwe beramberî gelê Rojava rabin, eyîn bi vê gotinê anî ziman îro roja namûsê ye. Karekî pir pîroz tê kirin, di encamê wê de ENKS’ê bi rêz Mezlûm Ebdî re hevdîtin kirin, kom pêk hat, lê ev kombûn bidawî nebûye, hîn rojên pêş li pêşiya me hene, serdanekî giştî partiyan bê cûdahî tê kirin. Karekî pir gerim bi çoş û qebûlkirineke hêja jî di vî alî de tê kirin, ev jî hêviyên mezin li cem gel dane avakirin, di rojên pêş wê diyar bibe ku ev civîna çiqasî bandora xwe li ser gel dikin.

# ‘Bêdengiya Navnetewî hedefgirtina rojamevanan rewa dike’

**Dîlan Mulhim/ Qamişlo**

**Rojnamevanên Başûrê Kurdistanê diyarkirin ku dewleta Tirk bi hevkariya PDK‘ê rojnamevanên Ragihandina Azad dike hedef, herwiha armanca êrişan qutkirina dengê heqîqetê ye.**

Dewleta Tirk a dagirker bi alîkariya PDK‘ê hertim êrişî gelê kurd dike û bi taybet rojnamevanên ragihandina azad dike hedef. Di derbarê hedefgirtina rojnamevanên li Başûrê Kurdistanê, rojnamevan Baran Germiyanî û Ibrahîm Êzidî ji rojnameya me re axivîn.

**‘Dewleta Tirk bi alîkariya PDK’ê rojnamevanan dike hedef’**

Baran Germiyanî di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Dewleta Tirk bi zanebûn rojnamevanan dike hedef û bi taybet jî rojnamevanên jin, ji ber ku jin bi hişmendiya azadiyê pêşengtiya civakê dike û ew vê yekê ji bona xwe metirsî dibînin, ku bi tu awayekî nikarin îradeya jina azad û jinên di nava kar û xebatên ragihandinê cihê xwe digrin bişkînin. Di heman demê de me dît ku ne tenê dewleta Tirk vê yekê dike, herwiha ev yek bi kevkariya PDK’ê ya bê sînor jî tê kirin. Bi awayekî ku her rojnamevanekî li Başûrê Kurdistanê li ser gendelî, neheqî û îxaneta PDK‘ê kar bike. PDK’ê jî gelek rojnamevan revandin, kuştin û kirin zindanan, an jî sûcên cuda li ser wan barkirin û hewl tê dayîn ku kesayetiya wan bişkînin û nehêlên ku dengê rastiyê.”

**‘Divê sûcên dewleta Tirk di asta navnetewîde de bêne belgekirin’**

Baran Germiyanî axaftina xwe wiha qedand: “Ji bo rê girtina van êrişan dikar e gelek kar bê kirin, ji wan jî beriya her tiştî rojnamevanên ku li Başurê kurdistanê kar û xebatê dikin li hemberî kiryarên PDK’ê bi baldarî tevbigerin û hemû kiryarên ku di derheqê rojnamevanan de têne kirin ji raya giştî re eşkere bikin. Eger duh çend rojnamevan hatine şehîd kirin, îro dora wan e, angu dewleta Tirk û PDK’ê nasekinin û hebûna gelê kurd dikin armanc. Herwiha girîng e li dijî vê yekê toreke berfereh a rojnamevanan li dijî êrişî û sûcên dagirkeriya Tirk bê avakirin û hemû kiryarên wê yên dijmirovî werin eşkerekirin.”



Baran Germiyanî



Birahîm Êzidî

**‘Endamên ragihandina azad dibin armanca dagirkeriya tirk’**

Birahîm Êzidî jî girêdayî heman mijarê wiha got: “Di dema ku her kes ji Şengalê direviya û hêzên pêşmerge pişta xwe dan civaka Êzidî, endamên Ragihandina Azad xwe di nava hemû şert û mercên herî giran de gihandin Çiyayê Şengalê û tiracediya fermana 3’ê Tebaxa 2014’an ji raya giştî û cîhanê re eşkere kir. Endamên ragihandina azad gav bi gav li kêleka şervanên azadiyê şer û berxwedaniya bêhempa ya li dijî çeteyên DAIŞ’ê şopandin û gihandin tevahî cîhanê û bi bandora vê yekê cîhan tev bû şahidê berxwedan û têkoşîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dijî dagirkeriya tirk û çeteyên wê. Ji bo her êrişeke ku li ser civaka me, endamên ragihandinê xwe berpirsiyar didîtin û ew bûne pira di navbera gel û raya giştî ya cîhanê de. Ev rewşa ku em behsê dikin me bi çavê xwe dît û li Şengalê pêkhat, lê em di wê baweriyê de ne, ne tenê li Şengalê li hemû qadên ku têkoşîna ji bo azadiya gelan hatiya meşandin û ragihandin ev yek hatiye kirin û her tim xebatkarên ragihandinê di asta pêşengtiyê de cihê xwe girtine û her tim dibine armanca êrişan û ji bona ku rastiyê bighînin raya giştî cane xwe jî fedakirine”.

**‘Hedefgirtina rojnamevanan sûcê şer e’**

Birahîm Êzidî axaftina xwe wiha bi dawîkir:” Hedefgirtina rojnamevanan sûcê şer e pêwîste neyê qebûlkirin, dema ku çeteyên DAIŞ’ê êriş bir ser rojnamevanan, ger wê demê cîhanê dengê xwe li hemberî van kiryaran bilind kiribe, di roja me ya neha de jî wê dagirkeriya Tirik cesaret nekiriba ku rojnamevanan bike hedef. Lê dagirkeriya tirk û çeteyên wê ji Şengalê bigire heya Bakur, Başûr û Rojava endamên çapemeniya azad dike hedef, lê tu deng ji saziyên ku xwe wek parêzvanên mafê mirove didin xuyakirin dernakeve. Lê li hmberî hemû êriş û gefên dagirkeriya tirk û çeteyên wê her tim endamên ragihandina azad di nava kar û xebatê de bin û nehêlin ku rastî di tariyê de bimînin.”